

Ji bona Serperestîya Demokratî

Heval û Birayên hêja!

Berî demeke kurt çavên min bi Kovara weyî Demokrat jimarên 1, 2, û 4 hate ketin. Ez bi derkatina vê Kovara weyî hanê pir dilşad û bextiyarbûm. Min ew ji xwe re date xuwendin. Ez di naveroka wê de gehiştim.

Derkirina Kovareke wisa bi navê Demokrat û li ser rêbazekî wisa girîng di mêjûna xebata me de cihekî weyî taybetî dê bête dîtin û hêjî bêtir dê ew bi erkê xweyî mêjûyîyî gewre bête rabûn, ser ku ew bi rastî û durûstî û hêjî bêtir bi zanebûn û dilsozî li ser bingehê Demokrasîyê ji bona çarekirina pirsîyarîya Kurd bide xebatkirin û hêjî bêtir bi zanebûn li ser Rêbazê Berzanîyê Mezin bête çûn, ku ew jî di xebata serxwebûna kurdîstana me de û di yekbûna hamû Hêz û Hinerên Kurdîyî Cuda de tête dîtin. Bawerîya me bi Demokrasîyê û bi yekbûna Hêz û Hinerên Kurdan bi cudabûnên wanî Sîyasî, Idyolojî û Çinayetî bi carekê li seranserî kurdîstanê ji bona serxwebûna kurdîstana me ev bi xwe divê bête zanîn, ku evaya bi xwe jî awat û Armanca Berzanî bi xwe bû. Weha bi vî rengî û li ser vî rêbazî jî bi zanebûn û dilsozî Demokrat li Ewropa dikare bi rastî û durûstî hemû Dilsozên Welatê me li dora xwe bide civandin û ji bona pêşvexistina Zimanê me û Sîyarkirina Gelê me bi xurtî bide xebatkirin. Ez hêvîdarim, ku dê hûn li gora nav û Nîşanê xwe bin û her wehaji lo gora rêbazê Berzanî bi xwe bin û dê hûnê her û her ala bîr û baweriyên Demokrasîyê di nava Civaka Kurdîstana me de bidin berz û balakirin; ji ber li gora bîr û bawerîya min bes û bi tenha xebata tevaya Kurdîstanê li ser bingehê bawerîyê bi demokrasîyê û bîr û baweriyên cuda di nava xebate meyî sîyasî de em dikarin Kurdîstanê ji nava pencên Talankerên, Mêrankerên Borcuwaziyên Turk, Erebi û Farisî bidin rizgarkirin. Ew talankerên hanê ji meî de her û her kurmên duberîyê û berberîyê di nava me de didin xwedîkirin û di encamê dawî de xebata me pê didin lawazkirin û xistin, da ku ew bêtir û bêtir Welatê me bidin talankirin û Miletê me ji xwe re bidin kole û bendekirin, na hêjî bêtir wî ji xwe re, mîna ku vaye li Kurdîstana Iraqê ji bal Rêjîma Fasîyî Eflaqî tête kirin, dixwazin bi Çekên kimyawî û Biyolojî bidin qirkirin. Ev tev de li ser me Kurdan didin neçarkirin, ku em tev hevdu bidin girtin û em xebata xwe li seranserî Kurdîstanê bidin yekkirin û ji bona Serxwebûn û yekîtiya Welatê xwe dest li nava destan bidin xebatkirin. Bêgî vana Ev Miletê Mêrxas, Gernas û Kevnar dê bête qirkirin û nav û nîşanên wî dê ji bal Fasîyên Turk, Faris û Yêni Erebi ji ser rûwê Zeminê bête rakirin û windakirin. Lêbelê ev Miletê weha Mêrxas, Gernas û Kevnar ji berî Pênc Hezar sal ji pêla Somerîyan, Êlamiyan, Babilonîyan, Aşûriyan, Akadiyan, partîyan, Hitîtan, di dema Erebiyî Musulmanîyê de, di dema Mengolîyan de, di dema Şahîn Şahiya Sefewî de, di dema Seltepetâ Osmanî de û tanî vê roja me jî her û her jî wî li ber man û nema xwe daye dan û her û her wî hebûna xwe daye parastin. Hîç jî gûman tête nayete dîtin, ku dê ev Miletê weha Mêrxas û Gernas, Pehlewên Rojhilata Navîn careke din jî ji xwe re tevaya Hêz û hinerên xweyî Milî li seranserî Kurdîstanê bide civandin û bi yekkirin, da ku ew xwe ji vê nemana hanê bide parastin û tevaya Kurdîstana xweyî perest bi Serxwebûnê û pêkanîna Dewleteke Milî di Rojhilata Navîn de bide bi tac û xelatkirin.

Weha bi vî rengî xebata me di vê rojnîgarîya me de pir bi dijarî û sengînî tête derketin û ew me bi darê zorê duçarî neçarî yekîtiyî li ser bingehê demokrasî dide kirin, da ku em mîna Miletê li ser xaka xwe bikaribin bi azadî, serbestî û bextiyarî bêtin jiyandin.

Heval û Birayên delal!

Me di rûya kovara xwe de carekî pirî giran û sext bi ser milên xwe ve dayite hildan. Lêbelê jî ev karê haneyî perest jî pir xweş û bextiyar ji bona her Mirovekî Welatperwer û Dilsoz tête dîtin. Em tev bi hev re divê bi vî karê perest ji bona Serxwebûna Kurdîstanê û yekbûna wêna rabin, da ku em jî mîna Mirovan li ser rûwê vê zeminê bêtin jiyandin.

Heval û Birayên hêjal

Li gora bîr û bawerîya min derkirina Kovara we bi du Zimanan li gel hev baş niye. Xwezî hûn bikaribin wan ji hevdu bidin cudakirin. Yekê xurû bi Zimanê Kurdî û ya din jî bi Zimanê Turkî bidin derkirin. Raste, pir Rojname û Kovarên kurdî bi du Zimanan hatine destpêkirin û derketin, lê di encamê dawî de jî wan xwe bi yek Zimanî daye kirin. Ezê pir dilşad û bextiyar bim, ger ku hûn jî vê Kovara hanê jî berî her tiştî jî bi Zimanê meyî Zikmakî bidin derxistin.

Ez hêvîya bi serketina we dixwazim

Berlin , di 1. 8. 1989 de
S O R O

Navnîgama min: Dr. M. S. G O U M A
1147 Berlin
M u l l e r S t r . 56
P F . 210 - 16
D D R